



Aqahî li ser rêya alîkariya qurbanîyên şerê Sûriyê (Qerara Konfederal ya 6. adarê 2015)

Meclîsa konfederal di 6. adarê 2015 an de ji nû ve tedbîrên parastina Sûriyan belav kirin. Bi vê yekê bi piranî di dem û maweya sê salan de 3000 Sûrî dikarin werin Swîsre.

Ev yek jî bi alîkariya du kiryar û rêyên cuda çêdibe:

- 1) Bi piranî 1000 kes îmkana xwastina vîsa ji bo hatina Swîsre li cem wan heye. Ev yek jî tenê ji bo malbata biçûk e (jin an jî mêr und zarokên di bin 18 saliyê re) yên îqameya însanî bi wan re heye (kesên xwedî îqameya F).
- 2) Ji bilî wê jî di dema sê salan de 2000 şexs wê li Swîsre werin hembêzkerin û pêşwazîkirin. Ev yek jî çêdibe bi hevkarî navbera heyeta bilind ya penaberan ya neteweyên yekgirtî UNHCR û bernameya jê re jinûve-bicîhkirin tê qotin.

Haydarî: Ev bername di dereceya yekemîn de ji bo wan kesên xwe li Lûbnanê li cem UNHCR qeydkirine ye. Şexsên parastin ji wan re divê, lê li welatekî din in, ew dikarin li cem sefareta Swîsrî li wî welatî daxwaza vîsa însanî bikin. Tu tesîr û bandora XAÇA SOR SRK li ser veqetandina mirovan ji bo jinûve-bicîhkirinê tune ye. **Ji bo îmkana jinûve-bicîhkirinê, pir girîng û muhîm e, ku ew kes xeberê bidin UNHCR û dereceya mirovantiya wan li Swîsre bêjin û ragihînin.** Hin pîvanên din ên veqetandina van kesan cewherî û bingehîn in. Hûn Agahiyên zêde li ser vê karê qebûlkirina kesan li ser vê girêdanê dibînin: <https://www.bfm.admin.ch/bfm/de/home/asyl/syrien.html> (Resettlement, Merkblatt).

Pêvajoya îqamê hatinê ya endamên malbata biçûk a kesên ji Sûriyê ji ber şer koçber bûne û vîsa însanî standine:

Ev qerar ji bo kê çêdibe?

Ev çalakî û kar tenê ji bo 1000 kesên parastin ji wan re divê bisînorkirî ye. Tenê kesên dikarên jê feyde bikin jî jin an jî mêr û zarokên heya 18 salî yên kesên Sûrî ku berê li Swîsre dijîn û îqama însanî standine (kesên xwedî nasnameya F).

Muhim: Têkîliya malbatî divê berê bi şexsên li Swîsre dijîn re hebe (ji ber bazdan û reva ji şer malbat „ji hev cuda bûye û qetiyê“).

Jin, mêr an jî zarok divê wexta daxwaza wan tê dîrasekirin û xwandin yan li Sûriyê bin, yan jî tu îqameya wan a cîgir û daîm li welatên cîran tune be (Lûbnan, Urdun, Tirkiyê an jî Misir).

Daxwaz çawa dikare bê xwestin/pêşkêşkirin?:

Kesê nasnameya wan F e û li Swîsre dijî, gerek daxwaz û teleba nivîskî bi kaxetên lazim ve bişîne ji (SEM) Daîreya koçberiyê re. Di vê daxwazê de divê agahî û malûtamên temam (nav, pêşnav, tarîxa jidayîkbûnê, hemwelatî/ Muatên, rewşa şexsî û dereceya mirovtiyê) hatibin nivîsandin û heke îmkana hebe nisxeyek/kopî ji paseport û kaxetên ehwal medeniyê. Hemû kaxetên bi Erebî, divê bi rêya mutercîmekî resmî bi Almanî, Fransî, Îtalî an jî Îngilîzî werin wergerandin.

Heke paseport an jî nasnameyên şexsî tune bin:

Di vê rewşê û halê de divê sûretên şexsan werin girtin û şandin, divê nav, pêşnav û tarîxa jidayîkbûna wan şexsan li ser bin. Ev wêne û sûret divê şexsiyeta mirov îsbat bikin.





Piştire divê mirov bêje wî li kîjan sefaretê daxwaza vîsa pêşkêş kiriye (Bi giştî Îstanbul, Beyrût, Eman an jî Qahîra).

Xaça Sor SRK ji we re nimûneyek/teleba xwastina vîsa ji SEM daîreya koçberiyê amade kiriye.

Daxwaza Vîsa/Teleb divê bi rêya posta madmûn (Einschreiben) li ser vê navnîşanê/adrêsê were şandin:

SEM
Abteilung Zulassung Aufenthalt
Quellenweg 6
3003 Bern - Wabern

Ji endamên din yên malbata mirov re jî ev tişt girîng in, ku mirov bizanibe: Ji bo şexsên tehdîdeke rasterast û jidil li ser laşê wan heye û jiyana wan di xeterê de ye, mirov dikare ji bo hatina wan daxwaza vîsa însanî ya „normal“ bike. Ji kerema xwe re, bila haya we jê hebe, ku ev vîsa jî gelek kêmtê dandin

Muhim: Hin malbatên rewşa wan xas û taybet e, wek mînak, zarokên temenê wan di ser 18 salan re ye an jî hin endamên malbatê, ku tê îsbatkirin berê bi xwediyê telebiyê an jî daxwazê re dijîn û nikaribin feydeyê ji vê qerar û tevdiran bibînin, ji kerema xwe re xeberê bidin me.

SEM daîreya koçberiyê daxwaz û telebiyan çawa dixwîne û dîrase dike?:

SEM kaxetên mirov şandine baş lê vedigere û ji kesê telebî qedimandiye re nameyekê (Avis) diştine û dibêje eger piştî xwandina van kaxetan şertên dandina razîbûna seferê bi ich hatine lê na. SEM tekîd dike, eger agahiyên di van kaxetan de wek agahî û malûmatên xwediyê telebiyê berê di xwastina mafê penaberiyê û mehkemê de gotibûn wek hev lê na.

Dema miwafaqe û qerar (Avis) erê be, hingê ji xwediyê telebiyê tê xwestin, qerara miwafaqê (Avis) bişîne ji kesên telebî ji wan re hatiye çêkirin ango ji malbata xwe re ji bo ew jî biçin sefaretê bo kaxet û tedbîrên hatina wan werin hazirkirin.

Dema biryar (Avis) îcabî be, kesên miwafaqa wan hatiye lazim e di hundir sê mehan de bi mûmesîliya Swîsrî li derve re têkiliyê çêbikin ji bo sozêkê ji bo hazirkirina vîsa însanî deynin/bistînin.

Haydari: dema qerar îcabî be jî, kesên miwafaqa wan hatiye divê dîsa elleh biçin Sefareta Swîsrî ji bo îcraat û tedbîrên/rêresmên derketina vîsa bînin hazirkirin. Ji bo vê yekê jî divê mirov sozêkê li cem sefareta Swîsrî çêbike/mewidekî bistûne. Dema mirov çû soza xwe jî divê van kaxetan bi xwe re bibie:

- Daxwaza/telebiya xwastina vîsa (1 ji bo her şexsekî)
<https://www.bfm.admin.ch/bfm/de/home/themen/einreise/visumantragsformular.html>
- 2 sûret/wêne
- sûretên paseportan
- Mektûba/miwafaqa razîbûna SEM (Avis)
- Wesîqên medenî ji bo jin an jî mêr û deftera malbatê/malbatname ji bo zarokan (Eger bi Erebi be divê bê tercemekirin)
- Paseport/cewaz sefer

Sefaret jî daxwazî/telebiyê li gorî zanîna xibreta xwe dixwîne û tekîd dike.





Heke daxwaz/telebî nehat qebûlkin, despeka daxwazi ez dikarin çi bikim?

Mixabin, mumkîn e SEM daxwaza telebiyê qebûl neke. Gelek sebeb jî ji bo vê yekê hene. Li dijî refdê mirov dikare îstînafê bike. Mirov azad in li kîjan sefaretê Swîsrî daxwaza vîsa însanî pêşkêş bikin. Ji bo vîsa însanî jî pîvan hene (Li deftera SRK agahî li ser vîsa însanî binihêre). Carekedi dikarin daxwaz bikin (kaxate xwe wexte sedeme hatine pekbene jibo Malbata xwe Bighene hev.

Ez ê çawa bikim dema sefaretê Swîsrî telebiya min qebûl kir û destûra seferê da?

Dema pereyên mirov tune bin û ev hincet bi rêya daxwazekê bê tekîdkirin, mesref û lêçûna seferê jî dikarin werin dandin. Ji bo vê yekê divê telebek ji SEM re were şandin.

Piştî sefera kesên hatibûn qebûlkin divê haya min ji çi hebe?

Vîsa însanî tenê ji bo sê mehan e: Di van 3 mehan de kesên li Swîsre dijî û telebî çêkiribû divê malbata wî li cem wî li mal bijî.

Di van sê heyvan de mirov dikare daxwaza mafê penaberiyê bike, licû bixwaze, an jî di ich de li kantona kesê ew dawet kiriye daxwaza îqama însanî bike.

Haydari: Heya kesên hatine wir ne li cem kantonê bin, ango îqama însanî nexwestibin an jî ne li cem hukûmeta konfederal bin, ango daxwaza penaberiyê nekiribin, kesên telebî û dewe ji wan re şandiye mesûl û berpîrsê mesref, sîgorte (temîn) û xanî ji bo wan in. Kengî ev kesên bi telebî hatine vir hatin qeydkirin, hingê temîna wan çêdibe û alîkariya pereyan ji wan re derdikeve. Qeydkirin dikare di roja yekemîn de ya hatina van kesan ya Swîsre çêbibe.

SRK Xaçê Sor çawa alîkariyê dike?

Îstîşara û şêwirmendiya SRK ya Vîsa ji bo Sûriyê di xizmeta we de ye dema pirsên we hebin. Xaçê Sor SRK ji we re nimûneyek/teleba xwastina vîsa ji SEM daîreya koçberiyê amade kiriye.

SRK dikare çavekî li rastnivîsandina telebiyên we bigerîne, lê nikare van telebî û daxwazan ji we re dagire an jî îmze bike.

Ji bo têkiliyê:

Beratungsdienst Visa Syrien
Abteilung Integration und Rückkehr
Department Gesundheit und Integration

Postadresse:
Rainmattstrasse 10
Postfach
3001 Bern

Telefon:
031 387 72 00
(Duşem-înê, 14.00 Uhr bis 16.00 Uhr)

syrien@redcross.ch
www.redcross.ch

Divê pêşî soz û mewîd bê danîn

